Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 493 21- Mijdar - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

**Hêzên Sûriya Demokratîk QSD, ji bo xebatên parastina axa Sûriyê perwerdeya şervanên xwe berdewam dike. QSD'ê li Reqayê dewreya perwerdeyê ya 3 focên leşkerî bi merasîmekê bi dawî kir. Di merasîma bi dawîkirinê de ji Fermandarên QSD'ê Loqman Xelîl axivî û girîngiya rola QSD'ê ya ji bo Sûriyê anî ziman.**



# QSD, hêza parastina axa Sûriyê ye

Dewreya perwerdeyê ya 3 focên leşkerî yên ji şervanên Tûgeya Şehîd Elî El-Iraqî ya QSD'ê pêk dihat, bi merasîmekê li bajarê Reqayê bi dawî bû.
Di merasîma dewreya perwerdeyê ya bi nave "Şehîd Hêlîn Cûdî"de hejmarek endmên Meclisa Sivîl a Reqayê, nûnerên Partiya Pêşerojê ya Sûriyê, hin fermandarên QSD'ê û malbatên şehîdan amade bûn.



Di merasîmê de ji fermandarên QSD'ê f Loqman Xelîl axivî. Xelîl anî ziman ku herêmê di pêvajoyeke hestiyar re derbas dibe û da zanîn ku aloziya Sûriyê di encamên lihevkirinên navdewletî de kûrtir dibe. Loqman Xelî diyar kir ku divê çareserkirina aloziyê Sûriyê ji aliyê hêzên Sêriyeyî de pêk werew.
Xelîl wiha got: " QSD li Sûriyê hêzeke parastinê ye. Em çawa herêmên xwe ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar dikin em ê herêmên din ji dagirkeran rizgar bikin."
Rêvebera Meclisa Jin Xuleyxe Ebdê di merasîm de axivî û ev tişt anî ziman: "Her kes dizane ku em di pêvajoyeke çarenûsî de derbas dibin. Pêwîste em li hemberî her pilanên ku li dijî me têne kirin amade bin. Em xwediyê biryar û xwediyê vê erdî ne. ji ber ku bi xwîna şehîdan me xwe ava kir. Em ê li hemberî her êrîşan bisekinin û bi hêza xwe QSD'ê bawer in."
Paşê şervanan sonda leşkerî xwarin û merasîm bi dawî bû...*ANHA*

## Li Herêma Cizîrê Yaneya Asayîş lîgeya Karatê ya jina digre

Bi armanca pêşxistin werzîşa jin Şampiyona Karatê ya jinan ji temenê 10 salî û jêrtir ku 59 lîstikvan ji yaneyên wekî Yaneya (Qamişlo, Karkerên Cizîrê, Berxwedan û Asayîş) beşdar bûn. Ev şampiyon li stadyoma Ş.Zîlan a bajarê Qamişlo ser rojêk hate li darxistin. Ev şampiyona di vê salê de ya herî baş bû, ji ber ku vê carê şaştî anjî kêmanî di navbera koçên ku ew bixwe jî endamê Komîteya Jûrêne kêmtir bû. Ku di encama lîstikê de Yaneya Asayîşa ya karatê rêza yekemîn girt û servanê lîgeyê wergirt.
Bi hêyecan û hêzdayîna cameweran lîstik destpê kir, ku ev şampiyona Karatê ya jinan a temenê 10 salî dê rojek tenê dewam kir, ku di encamê de Yaneya Asayîş gihişte asta yekemîn û bi 42 xalan sernavê lîgeyê wergirt. Yaneya Qamişlo bi 25 xalan rêza duyemîn, Yaneya Berxwedan bi 24 xalan rêza sêyemîn û Yaneya Karkerên Cizîrê bi 18 xalan rêza çaremîn bû.
Di çarçoveya şampiyona karatê de, pêşkêşkirina kateyan hebû ku di kata ya giştî de Yaneya asayîşê yekemîn bû, û di kata yekane de Yaneya Berxwedan bû. Ku di dawiya pêşbirkê de kesên lîstikvanên rêza yekemîn bi mîdlî hatin xelat kirin û hersê yaneyên ku rêza yekemîn bi kupê hatin xelat kirin, her wiha ji hêla Yekîtiya werzşê a Herêma Cizîrê cilên werzîşê li hemû lîstikvanan hate belav kirin. *Ronahî/Qamişlo*







## Dîsa Jinên Qamişlo gihiştin dewriya Herêma Cizîrê

Di vekirina tureya yekemîn a çûyîna dewriya yaneyên Herêma Cizîrê ya futbola jinan, ku maç li stadyoma Qamişlo ya sergirtî ya bajarê Qamişlo bi beşdarbûna du yaneyan. Yaneya Qamişlo û Cûdî hate li darxistin.
Ku di maçeya yekemîn de Yaneya jinên Qamişlo bi hêz û bawerî lîstin ku di encam de 10 gol di kaleya yaneya cûdî de bê bersiv anîn. Ji ber wê jî jinên yaneya Cûdî bê moral û hêz man û nema karîbûn li berwxe bidin, bêyî ku dema maç bi dawî bibe xwe ji lîstikê vekişandin. Yaneya Qamşlo bi ser ket ku lîstikvana Yaneya Qamişlo Firyal Ehmed 6 gol, Aya Mihemed, Evîn Hesen, Mehabad Reşîd û Rehev Hisên her yek golek anîn, bi van serkeftinan Yaneya jinên Qamişlo gihiştina dewriya Herêmê. Ew dewriya ku Yaneya Ehlî Amdû bi bi 3 golan bi ser Yaneya Serê Kaniyê ketibûn. Wiha yaneya Jinên Qamişlo û Ehlî Amûdê qezenckirin û gihiştine dewreya dawî.
Piştî dawîkirina tureya yekemîn rêzeyên Dewrî evin:
1-Qamişlo 13+19 xal.
2-Ehlî Amûdê 13+16 xal.
3-Biratî 6 xal.
4-serê Kaniyê 3 xal.
5-Cûdî 0 xal.
*Ronahî/Qamişlo.*

## Em êrîşên dagirkeriyê qebûl nakin



Nerazîbûnên li dijî êrîşên dewleta Tirk yên li dijî Bakurê Sûriyê dewam dikin. Ciwanên Şoreşger ên Sûriyê li ber navenda xwe ya li Eyn Îsa daxuyaniyek dan û êrîşên dewleta Tirk şermezar kir. Di daxuayniyê de hat gotin ku ew êrîşan qebûl nakin û bê xwestin ew ê li dijî van êrîşan bibin mertalên zindî. *R-2*

## Bi sedan kesî şehîd şandin başûrê Kurdistanê



Cenazeyê şervanê YPG'ê yê Fransî Şahîn Qereçox û Elî Xebat yê ji Hewlêrê bi tevlîbûna sedan welatiyên Dêrik û Girkê Legê ji Deriyê Sînor ê Sêmalka ber bi Başûrê Kurdistanê ve hate şandin. Bi sedan şervanên YPG'ê û hêzên enternasyonalîst merasîmeke leşkerî li dar xist. Li deriyê Sêmalka malbata şehîd Elî Xebat ya ji başûrê Kurdistanê jî beşdarî merasîmê bû.*R-2*

## Em ê bi hêza xwe êrîşan têk bibin



Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik, ji pîrozbahiya salvegera damezrandina PKK'ê ya li Dortmûnd Almanyayê re peyamek şand û got, "Divê gelê me yê li Ewropayê pêşengiyê ji têkoşîna li dijî komploya nû ya DYA'yê re bike." Bayik diyar kir ku çawa ku wan 40 salan xwe spartine hêza xwe û têkoşiyane, ji niha û pê de jî wê bi hêza xwe û gelê xwe komplo û êrîşan têk bibin. *R-4*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 493 21- Mijdar - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# EW HER TIŞTÎ JI BO VEGERÊ DIKIN

**Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên xwe li Efrînê bi her awayî kiryarên li dijî mirovî dikin. Mal û milkên gel talan dikin û li ser şerê hevdu dikin. Welatiyên Efrînê yên li Şehbayê ku axa wan di bin dagirkeriyê de ye jî ji bo ku vegerin Efrînê li ber xwe didin.**



### DAGIRKERAN JI HEV 16 KES KUŞTIN

Leşker û çeteyên dagirker yên dewleta Tirk li Efrînê li ser malên gel yên ku didizin û talan dikin şerê hev dikin û hevdu dikujin. Di van sê rojên dawiyê de li Efrînê di navbera leşkerên tirk û komên çete yên wê de, ji hêzên taybet ên Tirk 3 mirî, ji Ehrar Şarqiye, ji Cebhe El Şamiye û ji Tûgayên Hamza bi giştjî 16 leşker û çete hatine kuştin û hêjmareke zêde jî birîngdar bûne.

### EM Ê VEGERIN EFRÎNÊ

Ji aliyê din ve berxwedana welatiyên Efrînê yên li şehbayê jî berdewam dike. Welatiyên Efrînê yên ku li Kampa Berxwedan de dimînin di nava şertên zehmet de têkoşîn û berxwedana xwe didomînin. Welatiyan diyar kirin ku ew ê tevî hemû zehmetiyan jî tekoşîna xwe bidomînin û xwe bi rêxistin bikin. Welatiyên Efrînê dan zanîn ku heta ku ew vegerin Efrînê ew ê li Şehbayê berxwedana xwe dewam bikin. *R-2*

## Rêber Ocalan mîmarê Rojhilatanavîn e




"Kongreya Krîza Şaristanî û Rêya Ber bi Modernîteya Demokatîk ve li Rojhilata Navîn" di 17-18'ê Mijdarê de li paytexta Lubnan Beyrûdê bi beşdariya siyasetmedar, akademisyen, rewşenbîr, rêxistinên jin û ciwanan, nûnerên partiyên siyasî yên Lubnan, Sûriye, Iraq, Misir, Tirkiy, Îran û Ewrûpayê hat lidarxistin. Di dawiya Kongreyê de encamname hat eşkere kirin û di encamnameyê de rola Rêber Ocalan ya di çareserkirina aloziya Rojhilatanavîn de hat destnîşan kirin. *R-5*

## Bi tecrîdê dixwazin Kurdan bê nasname bihêlin




Tevgera Azadî li Başûrê Kurdistanê piştî civîna xwe ya Desteya Rêveberiyê daxuyaniyek nivîskî da. Di daxuyaniyê de hat gotin ku Amerîka mijara Kurdan weke kartekê bikartîne, Tevgera Azadî diyar kir ku dewleta Tirk dixwaze bi tecrîda li ser Rêber Ocalan Kurdan bê nasname bihêle. Tevgerê balkişand ser biryara Amerîka ya li dijî Pêşengên Tevgera Azadiya Kurdistanê jî û diyar kir ku biryar li dijî hemu Kurdane. *R-4*

## Em ê rê li ber tundiyê bigirin




Bi rasthatina 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinan ya Cîhanê li Bakurê Sûriyê çalakiyên jinan dewam dikin. Seroka Buroya Jinan a Partiya Pêşerojê ya Sûriyê a Şaxê Şehbayê Xada Hemdo destnîşan kir ku ji bo ew bi temamî pêşî li şidetê bigirin ew xebat û têkoşîna xwe didomînin. *R-3*

## Kampanyaya 'Tundiya li jinê polîtîk e'



Tevgera Jinên Kurd li Ewropayê (TJK-E) bi beşdariya bi dehan meclîs, komun, însiyatîf û saziyên jinan ên li Ewropayê dest bi kampanyayeke nû kir. Kampanya bi şiyara 'Tundiya li jinê polîtîk e' dest pê kir û wê salekê bidome. Kampanya ji sê qonaxan pêk tê. *R-3*

## Bi tekoşînê jin wê tunduyê ji holê rakin



Çalakiyên jinan yên bi boneya Roja Tekoşîna li Dijî Tundiya li ser Jinan a Cîhanê dewam dikin. Jinên Qamişlo diyar kirin ku ew ê di hemû qadan de têkoşîna xwe ya azadiyê bilind bikin. jinan anî ziman ku jin wê bi têkoşînê bibin xwedî maf û îrade. *R-3*

## Dewleta Tirk zarokan dikuje, cîhan temaşe dike



Nerazîbûn û çalakiyên li dijî êrîşên dewleta Tirk yên li dijî Bakurê Sûriyê berdewam dikin. Bi vê armancê bi sedan şagirt û mamosteyên kantona Girê Spî meşek lidarxistin û êrîşên dagirkirinê yên dewleta Tirk şermezar kirin. Meşa ku veguherî mîtîngê de axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku zarok dibin hedefa êrîşên dewleta Tirk. Bang li hêzên navnetewî hat kirin ku li ber êrîşên dewleta Tirk rabin. *R-2*

## Meclisa Rêveber rewşa çandê nîqaş kir

Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi armanca gotûbêjkirina mijara çandê bi Desteya Çandê re civiya. Civîn li avahiya Rêveberiya Xweser ya li Eyn Îsayê hat lidarxistin. Di civînê de Hevserokên Meclîsa Rêveber Berîvan Xalîd û Ebdilhamid Muhbaş jî amade bûn. Di civînê de ji bo amadekirina rêziknameyeke hevpar komîteyek hate avakirin. *R-2*

**Tevgera Rexneyê** R-4
Qasim ENGÎN

**Aloziya Sûriyê kûr dibe** R-5
Zekî BEDRAN

**Metirsiya Mirovahiyê** R-6
Medenî FERHO

**Cîhanek bedew bi jina azad pêkan e** R-3
Avesta AMARGÎ

# Dewleta Tirk zarokan dikuje, cîhan temaşe dike

**Nerazîbûn û çalakiyên li dijî êrîşên dewleta Tirk yên li dijî Bakurê Sûriyê berdewam dikin. Bi vê armancê bi sedan şagirt û mamosteyên kantona Girê Spî meşek lidarxistin û êrîşên dagirkirinê yên dewleta Tirk şermezar kirin. Meşa ku veguherî mîtîngê de axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku zarok dibin hedefa êrîşên dewleta Tirk. Bang li hêzên navnetewî hat kirin ku li ber êrîşên dewleta Tirk rabin.**



Bi sedan şagirt û mamosteyên kantona Girê Spî li dijî êrîşên dewleta Tirk li ser Bakurê Sûriyê û hedefgirtina zarokan daketin qadan û gotin: "Erdogan zarokan dikuje, kanî parêzvanên mafên zarokan?"
Komîteya Perwerdeyê ya Girê Spî ji bo şermezarkirina êrîşên dagirkeriya Tirk û qetilkirina zaroka bi navê Sara Mistefa ji aliyê artêşa Tirk de, meşek li dar xist.
Meşa ku bi sedan mamoste û şagirt tev lê bûn, ji ber navenda perwerdeyê dest pê kir. Di meşê de, wêneyên şehîd Sarayê hatin rakirin. Her wiha meşvanan pankartên wekî "Ji dagirkeriya Tirkiyê re na", "Erdogan zarokan dikuje, kanî parêzvanên mafên zarokan?" hildan.
Meşê li Çerxerêya El-Elem bajar veguherî mîtîngê. Di mîtîngê de bi navê Komîteya Perwerdeyê ya Girê Spî Icêl Îdan û ji aliyê hin zarokan ve axaftin hatin kirin.
Di axaftinan de, êrîşên dagirkeriya Tirkiyê yên li ser Bakurê Sûriyê û qetilkirina zarokan hate şermezarkirin û ji civaka navteweyî û saziyên mafên mirovan hate xwestin ku van êrîşan bidin rawestandin û dewleta Tirk ji ber qetilkirina zarokan darizînin.
Mîtîng bi dirûşmeyên "Şehîd namirin" û silavkirina biratiya gelan bi dawî bû…*ANHA*

## Em êrîşên dagirkeriyê qebûl nakin



Ciwanên Şoreşger ên Sûriyê yên navçeya Eyn Îsa diyar kirin ku ew êrîşên dagirkeriya Tirk ên li ser Bakurê Sûriyê qebûl nakin û destnîşan kirin ku wê li hember dagirkeriyê bibin mertalên zindî.
Navenda Ciwanên Şoreger a Sûriyê ya navçeya Eyn Îsa ya girêdayî kantona Girê Spî daxuyaniyek da û êrîşên dewleta Tirk yên li ser Bakurê Sûriyê şermezar kir.
Daxuyaniya ku ji aliyê rêvebera Navenda Ciwanan Zehra Mihemed ve hate xwendin, wiha ye: "Em wek Ciwanên Şoreşger a navçeya Eyn Îsa êrîşên dagirkeriya Tirk ên li ser Bakurê Sûriyê bi tundî şermezar dikin û van êrîşan qebûl nakin. Li hember van êrîşan hêz û îradeya me ya berxwedanê zêdetir dibe.
Bila her kes bizane em ê bi ruhekî şoreşgerî li hember hemû êrîşên li dijî gelê Bakurê Sûriyê bisekinin. Ger bê xwestin em ê bibin mertalên zindî. Her wiha ger pêwîst bibe em ê bibin bombeyek û di hundirê wan de biteqin…
*ANHA*

## Bi sedan kesî şehîd şandin başûrê Kurdistanê



Cenazeyê şervanê YPG'ê yê Fransî Şahîn Qereçox û Elî Xebat bi tevlîbûna sedan welatiyên Dêrik û Girkê Legê ji Deriyê Sînor ê Sêmalka ber bi Başûrê Kurdistanê ve hate şandin.
Şervanê YPG'ê Elî Xebat yê ji Hewlêrê li bajarê Dêrikê yê kantona Qamişlo dema bi erka xwe radibû, di qezayeke trafîkê de şehîd bû. Bi merasîmekê cenazeyê wî û şervanê YPG'ê yê Fransî Şahîn Qereçox derbasî Başûrê Kurdistanê hatin kirin.
Li deriyê Sêmalka malbata şehîd Elî Xebat ya ji başûrê Kurdistanê hat beşdarî merasîmê bû. Bi sedan şervanên YPG'ê û hêzên enternasyonalîst merasîmeke leşkerî li dar xist. Piştî ku merasîma leşkerî bi dawî bû, hevalên şehîd Qereçox, Baran Qereçox û Ciwan axivîn û soza dewamkirina rêya şehîdan da. Di axaftinan de hate gotin ku şoreşa Rojava şoreşa mirovahiyê ye û ji bo hemû gelên herêmê têkoşînê dike.
Li aliyekî din jî fermandarê YPG`ê Elî Dêrik axivî û got lehengiya ku şehîdan pêk anî û serkeftinên ku li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi saya şehîdan pêk hatine.
Dêrik her wiha destnîşan kir ku şehîd Elî Xebat yek ji kesên destpêkê ye ku dema DAIŞ kete Zaxo û Şengalê, bersiva hawarê da, tu car gavek paşde neavêt heta ku gihaşt asta şehadetê.
Piştî ku axaftin bi dawî bûn, nasnameyên her du şehîdan hatin xwendin. Nasnameya şehîd Şahîn radestî hevalên wî kirin û ya şehîd Elî Xebat radestî bavê wî kirin.
Bavê şehîd Elî Xebat got ew bi şehadeta kurê xwe serbilind in.

## Meclisa Rêveber rewşa çandê nîqaş kir



Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi mebesta gotûbêjkirina mijara çandê bi Desteya Çandê re civiya. Di civînê de ji bo amadekirina rêziknameyeke hevpar komîteyek hate avakirin.
Civîn li avahiya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya li navçeya Eyn Îsa ya Girê Spî li dar ket. Hevserokên Meclisa Rêveber Bêrîvan Xalid û Ebdhamid El-Muhbaş û hevserokên deste û komîteyên çandê yên rêveberiyên xweser û sivîl ên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di civînê de amade bûn.
Beşdaran rewşa çand û hunerê, deverên şûnwarî, her wiha çawaniya parastin û sererastkirina wan gotûbêj kirin. Di civînê de, her wiha mijara aktîfkirina deverên turîzmê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku bibe jêdera aboriya herêmê, nîqaş kirin. Hate gotin ku divê çalakiyên çandî û hunerî bêne berfirehkirin.
Di dawiya civînê de ji bo amadekirina rêziknameyeke hevpar ji hemû deste û komîteyên çand û hunerê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê komîteyek ji 7 kesan hate avakirin.
Desteya Çand û Hunerê ya Rêveberiya Sivîl a Bakur û Rojhilatê Sûriyê li gel çand û hunerê qadên şûnwar û turîzmê jî dihewîne.

## Dagirkeran ji hev16 kes kuştin

Bîlançoya şerê navbera artêşa Tirk û komên wê yên çete ku li Efrînê qewimî, eşkere dibe.
Şerê li Efrînê yê navbera hêzên taybet ên tirk-qaşo artêşa milî û koma çete Ehrar Şarqiye, ku du rojan dewam kir, qediya.
Şer li ser çavnebariya her du aliyan a li ser talankirina zeytûnan derketibû. Li gorî agahiyan, dewleta Tirk pêşniyar li fermandarên Ehrar Şarqiye kiribû ku bi çekên xwe vekişin Îdlibê û ji bo wê dem dabû.
Tê gotin, beşek ji çeteyên Ehrar Şarqiye teslîm bûne û beşek ji wan jî bi çekên xwe ber bi Îdlibê ji bo tevlî El Nûsra bibin hatine şandin.

**BÎLANÇO**

Bîlançoya şerê dagirkeran wiha ye:
Ji hêzên taybet ên Tirk 3 mirî, 1 birîndar
Ji Ehrar Şarqiye 8 mirî, 11 birîndar
Ji Cebhe El Şamiye 1 mirî
Ji Tûgayên Hamza 4 mirî, 7 birîndar, 6 çete dîl hatibûn girtin.
Şer qediya jî be li Efrîna ku hatiye dagirkirin "qedexeya derketina derve" dewam dike.
Çavkaniyên herêmî dibêjin, dibistana Karama ya li Efrînê di dema şer de hatiye teqandin.
Her wiha zarokek birîndar bûye.

**DI TEQÎNÊ DE 5 KES BIRÎNDAR BÛN**

Ji aliyê din ve li navenda Efrînê, li ber avahiya 'polîsên leşkerî' yên çeteyên dewleta Tirk lê bûn, motorsîkleteke bombebarkirî teqiya. Ji ber teqînê 5 kes birîndar bûn.
Li taxa Efrîn a kevn a li navenda bajarê Efrînê, li nêzî dibistana El Keramayê teqînek pêk hat. Dibistana El Kerama ji aliyê çeteyên artêşa Tirk a dagirker ve weke 'navenda polîsên leşkerî' tê bikaranîn.
Motorsîkleta bombebarkirî roja 19'ê mehê sibehê teqiya û ji ber teqînê 5 kes birîndar bûn.





# Zarok ji bo çandê biparêzin fêr dibin

***Desteya Çand û Hunerê ya Efrînê xebatên xwe yên perwerdeya çandî berdewam dike. Deste li herêma Şehbayê jî xebatên xwe bê navber didomîne. Desteyê li kampên Serdem û Berxwedan yên li Şehbayê ji bo 60 zarokên Efrînê ji bo parastin û pêşxistina çanda Efrînê ya Kurdî dewreya perwerdeya muzîkê vekir.***



60 zarokên Efrînê ji kampên Berxwedan û Serdemê waneyên lêdana amûrên muzîkê bi hewldana Desteya Çand û Hunerê ji bo parastina çanda Efrînê dibînin.
Desteya Çand û Hunerê ya li kampên Berxwedan û Serdemê yên li herêma Şehbayê, dewreyên perwerdeyên muzîkê bi armanca parastina çanda Efrînê ji zarokan re vekirin.
Zarok hefteyê 2 rojan dersên xwe dibînin. Hejmara zarokan di dewreyê de 60 e. 20 ji wan ji Kampa Serdem û 40 ji wan jî ji Kampa Berxwedan in. Zarok pewerdeya xwe di konekî taybet de dibînin.
Desteya Çand û Hunerê bi rêya van dewreyan hewl dide çanda Efrînê li hember qirkirina çandî ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê li Erfînê pêk tînin biparêze.
Her wiha armanca desteyê ji van perwerdeyan ew e ku bi vekirina van dewreyan çanda gelê Kurd di nav nifşên nû de belav bike û bi pêş bixe…*ANHA*

# Gelê Efrînê xwedî zanista şoreşa zihnî ye

**Idrîs HENAN**

Endamê Meclîsa Rêvebir a Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê Heysem Mustefa ji derbarê avakirina Pirtûkxaneya Kampa Serdem ji rojnameya Ronahî re axivî û got: Berxwedana gelê Efrînê teyisandina şoreşa zihnî ya gelê Kurd e. Mustefa destnîşan kir: Hemû çapxane û pirtûkxaneyên rejîma Tirkiyê bi fetweyên AKP bê exlaqî, destdirêjî, talanî û diziyê nav civaka Sûriyê de belav dikin.

**GELÊ ME BÊ ÇARE NÎNE**

Heysem Mustefa got: Gelê Efrînê gelekî ji xwe bawer e. Ti carî sernizmiyê qebol nake. Tevî ku di encama dagirkeriyê de gelek taybetmendiyên jiyanê ji dest daye, lê xirûra wî rê nade kiryarên dagirkeran qebûl bike. Mustefa dewam kir: Gelê me li hemberî dagirkeriyê bê çare nemaye. Hewl bide xwedin û fêrbûnên xwe di bin van zerf û şertan de dewam bike. Mezin û biçûkên Efrînê cihên xwe bi israr di hemû saziyên rewşenbîrî, çandî û fêrkarî de girtine. Bi ruhê berxwedana ku li Efrînê 58 rojan pêk hatiye, îro bo vegereke bi rûmet li Şehbayê li ber xwe dide.

**BI DESTEKE ZAROKAN AVA BÛ**

Endamê Meclîsa Rêvebir a Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê got: Kaviliya li Şehbayê bala me kişand. Di nav kavilan de bi sedan pirtûk hebûn. Em ketin wê ferqê ku çeteyan ji bilî pirtûkan her tişta gelên Şehbayê dizîne. Ev jî li gorî Mustefa xwe dispêre zihniyeta rêbir a çeteyan. Mustefa dewam dike: zarokên Efrînê ji bo ku pirtûkan biparêzin, li aliyekî kom dirkin. Ew tabloya xwedîderketina li zanistê bala me kişand. Wê çaxê Meclîsa bi desteke Rêveberiya kampê biryar da ji bo zanistxwazan li Kampa Serdem pirtûkxaneyekê ava bikin. Mustefa bibîr tîne: Tevî ku karê hatiye kirin bi cefa bû, lê destek û alîkariya ku zarokan daye me gelekî hêja bû. Bi desteka wan me bi çiwalan pirtûkên rengereng kom kir.
Mustefa derbarê avakirina pirtûkxaneyê de got: Pirtûkxaneya Kampa Serdem di encama karekî kolektîv de bi awayekî hunerî û bi plan hate avakirin. Li dora pirtûkxaneyê parkek hat çêkirin. Di parkê de rûniştgehên xwezayî cih bi cih hatine dayîn. Dar û hişînahî hatin çandin. Ji bo xwendin û destgirtina pirtûkan tomargeh û arşîfa pirtûkxaneyê li gorî beşan hatine damezirandin.



**YEKEMÎN**



**PIRTÛKXANE YE**

Mustefa wiha dirêjahî da gotinên xwe: Ji bo veguhestina tecrûbeya kampên dîtir, me lêgerîna xwe bi riya têkîliyan bi aliyên cuda cuda re dest pê kir. Lê hemûyan jî tekez kirin ku ti carî li kampekê pirtûkxane nedîne. Ev îradeya gelê Efrînê ya avakirina avahiyeke zanist û ramanê ku bi riya wê zarokên xwe fêrî berxwedanê dike, li cem ti kesî nîn bû. Ev bi xwe nîşaneya serkeftina gelên Efrînê ye. Mustefa destnîşan kir: Piştî ku pirtûkxaneya Kampa Serdem hate vekirin, gelek aliyan ji herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Ewrûpa, welatên Ereb tekez kirin ku ji bo dewlemendkirina pirtûkxaneya Efrîniyan amade ne pirtûkan bişînin.

**REJÎMA TIRK TEŞWÎQÎ BÊEXLAQIYÊ DIKE**

Mustefa bal kişand ser pirtûkên hatine komkirin û ev tişt anî ziman: Di nav pirtûkên me komkirine de bi sedan pirtûkên ku xelkê fêrî tundiyê dikin hebûn. Çete hişmendiya Elqayîde û Îxawan Mislimîn bi desteka çapxane û pirtûkxaneyên rejîma Tirkiyê belav dikin. Rejîma Tirkiyê bi riya van pirtûkan xwînê gelê Sûriyeyê rijandiye. Tişta berê li vir dikir niha li Efrîn, Bab, Cerablus û Idlibê dike. Mustefa di vê derbarê de got: Di van pirtûkan da rejîm Tirk teşwîqî bê exlaqiyê dike û di bin navê ol de rewatiyê dide destdirêjî, talanî, dizî û kuştinê. Hemû jî bi fetweyên fermî ên saziyên olî yên desthilatdariya rejîma Tikiriyê pêk hatiye. Endamê Meclîsa Revebir a Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê di dawiyê de got: Berxwedana gelê Efrînê ne tenê leşkerî û siyasî ye. Di şexsê berxwedan gelê Efrînê de şoreşa zihnî ya gelê Kurd tê teyisandin. Însanan li gorî hişmendiya azad a fikir û ramanê ji nû ve ava dike.

## Filma 14'ê Tîrmehê wê li Silêmaniyê were pêşandan

Filmê 14'ê Tîrmehê ya li ser berxwedana 14'ê Tîrmehê wê li Sînemaya Salim a Silêmaniyê di 1'ê Kanûnê de bi jêrnivîsa Kurdî were pêşandan.
Li Sînemaya Salim a Silêmaniyê wê di 1' Kanûnê de Filmê 14'ê Tîrmehê ya li ser berxwedana 14'ê Tîrmehê ya Girtîgeha Amedê were nîşandan. Bi vê armancê Rêxistina Niwêger a ji bo Pêşxistina Hunerê li cihên giştî yên Silêmaniyê dest bi reklama film kirin. Wê film bi jêrnivîsa Kurdî were pêşandan.



Filmê berxwedana 14'ê Tîrmehê ku derhêneriya wê Haşim Aydemîr dike, li ser berxwedana kadroyên pêşeng yên PKK'ê, welatparêzên Kurd û şoreşgerên Tirkiyê ya li dijî zilm û hovîtiya dewleta Tirk li beramber girtiyên li Girtîgeha Amedê kirine, hatiye çêkirin.
Filma rojiya mirinê ya berxwedana 14'ê Tîrmehê heya niha beşdarî çend festîvalên film ên navnetewî û herêmî bûye û di çend qadan de jî hêjayî xelatê hatiye dîtin.
Filmê ku berxwedana şoregerên Kurd û Tirkiyê ya li dijî hovîtiya dewleta Tirk kiriye mijara xwe, li festîvalên film a Hindistan, Almanya, Brîtanya, Polonya, Silêmanî û Dihok'ê de (filmên dokumenterî) hatiye nîşandan. Herî dawî jî di festîvala filmên navnetewî ya Silêmanî de xelata rêzgirtinê girt û yekane film bû ku li ser daxwaza zêde ya bîneran du caran hate nîşandan. Di qada aktoriya herî baş û derhêneriya dîmen jî hêjayî xelatê hatiye dîtin.
Heya niha gelek filmên dokûmenterî û stran li ser berxwedana 14'ê Tîrmehê hatine derxistin.

## Rastiya Hunermend



**Hozan Seyîdxan**

Dema ku mirov behsa pêşketinên li ser rû xakê dike, û vedibêje mirov bixwaze an jî nexweze pêrgî hinek rastiyan dibe. Mînak di vê dunyaya zîvirok de gelek guhertinên renga reng rû didin. Bi vê re têkiliyên hilberîn, cihêxwaz dibe li gel vê mijarê jî huner û mûzîk jî cihekî pir giring û pêwîst digre. Her wiha heger ku bi van rengê guhertinan re jî mirov ne xwedî sekin û asoyeke vekirî be hingê pirsgirêk jî mezintir dibin.
Heger em rewşa Kurdistanê li ber çavan bigrin û her wiha pêre rewşa huner û mûzîka kurdî binIrxînin hingê mirov dikare di vê mijarê de gelek xalan zelal bike. Tê wê wateyê ku serdema afirandina mûzîka kevnetor- kilasîk - ya kurdî bi dawî bûye.
Bi taybetî çêker û afiranêrên vê şêweya mûzîkê hew dikarin bi vê pêvajoyê re bimeşin û gav bi gav di gerînoka pirsgirêkan de newq dibin û her ku dice lewaz û bê bîrdozî dibin. Li hember pêşveçûnên teknelojîk êdî xwe weke mûzîkçêkeran pênase dikin lewma jî qaşo van rengê mûzîkjenan ana gorî stranbêjan xwe awantajtir dibînin.
çima? Ji ber ku mûzîkjen bikaranîna amûra xwe û ji pêşketina teknelojîk sûd wer digre di hilberînê de xwe di ser yên din re dibîne, bê guman ev rewşa zemînên hêsabûnî pêyda dike.
Eger ku ev derfeta han bi zanebûnî û baş bête bi kar anîn hingê dikarin bibin sedema afirandinên bi bandor û giring, heger ji van rastiyan dûr û pîvanên civakê ji xwere bingeh negirin, ji hêvî û daxwazan re ku nebin bersiv, hingê wê demê dê berê huner û mûzîka kurdî ya resen ber bi biyanîbûnê ve bibin.
Li hêleke din jî ger ku xwe bi dispilînê re, ranepêçe û çav li piyaseyên derveyi xwe bin hingê wê demê ewê bi hêsanî têkeve destên qorsanan û xwe bisipêre saziyên dewletê û mîna amûrekî pir erzan û lewaz dê bête bi kar anîn.
Raste di vê çarçûveyê de pêwîste ku mafên hunermendê xwedî hilberîn hem madî û manewî bête parastin, ji ber ku sekin û rastiya huner û hunermend di kakila xwezaya xwede li dijî pergelên deshilatdare. Lewra jî weke berdevkê çanda civakan xwedî sekneke muxalife.
Lê mixabin îro hin kes qaşo bi navê hunermedan li ber çavê civakê di xêza ku desthildaran nîşandaye poz didin, ev jî tê wê wateyê ku ji bona berjewendiyên takekesî di bin sîwana sîstema desthilatdar de tevdigerin. Li hêla din jî hunermendên xwedî sekin û xwe baş parastî û xwedî helwest, afirînere di tu deman de xwe ne spartiye sîstemê û berevajî wê her gav xwe weke parastvan û afirandina hunera şoreşgerî û manewî xwedî helwesteke giran buha ye.
Hunermendê bi vî rengî bin hemî mercên zor û zahmete li ber xwe dide û di pêkhatinên zemînê de hunereke pir bi bandor û xwedî wate di afirîne.
Raste şer ne tiştekî başe ku mirov hemêz bike , lê şer ne ewe ku ji dûalî xweve çek hilgirtine, na ya herî giring helwest û sekneke raste, xwedî derketina li hebûn û nasnameya xwe bi sekneke şoreşgerî û xwedî rûmet jî cûreyekî ji şere.
Belê yên ku di nava van rastiyan de tev digerin pêşketinên sereke ji xwere asas û bingeh digrin û li gor pîvanên pêşketî tev digerin. Bi afirandina hunera xwede ya ku ji bandora teknelojî ya serdest parastî avakirê hunera madî û manewî ya civakê ye.

# Ji bo zarokan çalakiyên cihêreng

**Ji bo zarokên Efrînê yên ku ji ber êrîş û dagirkeriya artêşa Tirk û çeteyên wê ku li herêma Şehbayê bi cih bûne çalakiyên cihêreng tên lidarxistin. Komîteya Desteka Derûnî ya Zarokan a Şehbayê bi armanca ku bandora dagirkirina Efrînê û şerê ku rû daye li ser zarokan bibe piştgiriyê dike.**



Komîteya Desteka Derûnî ya Zarokan a Şehbayê bi armanca ku bandora dagirkirina Efrînê û şerê ku rû daye li ser zarokan bibe piştgiriyê dike.
Komîteya Desteka Derûnî ji endamên saziyan pêk tê û bi armanca tunekirina tesîra şer ya li ser zarokan ku di encama dagirkirina Efrînê de pêk hat, dixebite.
Komîte bi hevkariya Heyva Sor a Kurd, Desteya Kar û Barên Civakî û Xebitandinê û Komîteya Perwerdeya Civakî ya Efrînê bi armanca pêşkêşkirina desteka derûnî ji zarokên Efrînê re ku li kampên Berxwedan û Serdemê û Şehabyê dimînin, hate avakirin.
Komîte li gorî bername û plansaziyeke ji 3 qonaxan pêk tê, dixebite. Pêgava yekemîn avakirina baweriyê di navbera komîteyê û zarokan de bi rêya rêxistinkirina şahiyên giştî û çalakiyên hunerî. Vê pêngavê mehekê dewam kir. Di pêngava duyemîn de gelek xebatên perwerdekirinê bi şêwazên cuda hatin meşandin. Gelek şanoyên kurt û bi armanca girêdayî şîretên paqijiyê, parastina tenduristiyê û birêxistinkirina demê di hefteya borî de hatin pêşkêşkirin û ev xebat wê were berdewamkirin. Armac ji pêşkêşkirina van berheman girêdana zarokan bi çand û zimanê dayikê, xilasiya ji bandorên şer e. Her wiha di nav van çalakiyan de pêşbirkên çandî di navbera zarokan de tên lidarxistin.
Di pêngava sêyemîn de zarokên ku ji ber pirsgirêkên derûnî zehmetiyan dikişînin, tên diyarkirin û ji koma desteka derûnî re ku ji pisporên derûnî û civakî pêk tên, têne şandin. Her wiha di vê pêngavê de semînerên girêdayî şêwazên danûstandina bi wan zarokan re tên lidarxistin.
Têkildarî mijarê Endamê Komîteya Desteka Derûnî Egîd Xelîl diyar kir ku gelek rêxistinên têkildarî mijarê serdana kampê kirine. Lê ji ber ku zimanê Erebî di xebatên xwe de bi kar anîn, hewldanên wan bê encam man û wiha dewam kir: “Ev zarok zarokên me ne. Em baş dizanin ku çi dîmenên şer ên hovane dîtine û jiyane.”
Lîstikvanê şanoyê Heyder Mistefa jî wiha got: “Bi rêya pêşkêşkirina şanoyan armanca me girêdana zarokan bi çand û zimanê kurdî ye. Me beriya hefteyekê dest bi rêxistinkirina şanoyên girêdayî paqijî, parastina tenduristiyê û birêxistinkirina dem û hezkirina xwendinê û ziman kiriye.”…*ANHA*

## Metirsiya Mirovahiyê



Medeni FERHO

Mirovahî di serdemek giring de ye, rastî û rûmet jî ketiye bin metirsiyek dijwar... Dema rastî li holê namîne, vijdan tê kuştin, dema rumet namîne, mirovahî tê kuştin.
Dewlet kujer in û pêşdeçûna mirovahiyê tê asteng kirin, veger û hewldanên li sedsala navîn hene.
Kesên di lêgerîn û xeyalên sedsala navîn de, Don Kîşot in û îdeala wan têkçûyî ye. Hêzên ku sînorê materyalîzma di kesayeta Sanço Panza de derbas kirine, yhenekên xwe bi mirovahiyê dikin.
Derbaskirina Sanço Panza, selefkariya Hecî Pepe ye û kesên rastiyê dibêjin ya dikujin, yan jî tecrîd dikin.
Ji gelek mînakan, em ê tenê çar mînakan bidin; Yek, dem gelê Kurd, xwest rêveberiya herêmî bike pratîkê, dewleta Tirk 8 bajarên Kurdistanê, bi slogana “kevir li ser kevir nehêlin, serî li ser bedenê nehêlin” xera kirin, serdema çalên asîdê, kuştinên kujerên wan ne diyar dane dest pê kirin.
Hewldana rêveberiya herêmî û avakirina şaredariyên gel, tevger û ji holê rakirina nakokî, şikestîk û newekheviyê bû; hewldanek diyalektîkî bû. Lê, xeyalperestên serdema Osmanî, gund, bajar wêran kirin, li darî çavên cîhanê komkujî kirin.
Du: Başlkêş e, Rêber Abdullah Ocalan, li Tirkiyê û herêmê xwest aştiyê pêkbîne. Di Newroza ‘93an de peyamek da. Cîhanê peyam bi çepikan himbêz kir. Lê, xeyalperestên, ku di navbera îro û doh de diçin û tên, bi mêjiyekî xerabe xwestin çerxa felekê û dewrana cîhanê biguherin. Aştîxwaz Ocalan tecrîd kirin, şerekî giştî dane dest pê kirin. Tecrîd jî, bûye çavkaniya qirkirina gelên Kurdistana Bakur, Rojava û Başûr.
Gelê Kurd, di aliyê hiquqî, exlakî, vijdanî, civakî, mafê rewa û demokratîk de, deriyek nema ku lê nedan. Cîhan lîstika sê meymunan dilîze; mixabin, di rewşek trajedî komîk de ye û seremoniyek feodal jî nalorîne. Ev jî weytî jarê ye!...
Bêguman, mînakên bûyerên trajîk gelek hene... Têkiliya van bûyeran teva, bi rûmet û rastiyê re heye; rûmet û rastî jî, bi vijdan, edalet, hiquqê gerdûnî, peymanan û demokrasî ve girêdayî ne.
Mînaka sêyemîn, “hawar jarê” ye û kuştina ademiyetê ye.
Wek gelek kuştinên hovane; rojnamevanê Siudî Jamal Khashoggî, bi terora navneteweyî, di rengê engizîsyonê û bi motîfên erotîk hate kuştin. Bedcanê Suudê ku, zarokên Cn. Pêxember kuştin û xwe kire bavê ereban derkete holê. Vî bedcanî, Khashoggi bi hunandinek “romana celadan”, yan jî, “romana vampîran” kuşt.
Romana kuştina Khashoggî, ji kulturê, ji ademiyetê dûr e, lê bi siyaseta qirêj û psîkolojiya nexwşe ve girêdayî ye. Muxatabê van mînakan Tirkiya komarger e, Siudiya qraliyet e!...
Li Tirkiyê, têkçûna sosyo-polîtîk heye û kuştina amurên sosyo-kulturê ye û bi şikefta tarî ve diçe. Siudî jî, di şikeftek tarî de ye û niyeta wê nîne ji şikeftê derkeve!...
Mînaka 4. biryara Emerîka ya li dijî pêşengên Haraketa Azadiya Kurd e. Emerîka, Beyanameya Mafên Mirovan û Beyannameya Serxwebûna Emerîka tune kirin. “... her kes weke hev e û xwedî mafên ku kes nikare jê bistîne ye.” Lê biryara Emeîrka li dijî ve ye, weytî jarê ye!...
Cîhana ku, li hemberî kiryarên Tirkiye, Siudî û Emerîka bêdeng e, normên estetîkê dikuje. Cîhana ku normên estetîkî lê nebe, hêvî, xewn û xeyalên paşerojan nînin. Di van mînakan de razên veşartî nînin, her tişt ayan beyan e. Zindîkirina feodalîzma barbarî ye û hêleya kuştina rastî û rûmetê ye.
Ewropa jî, krîterên Kopênhagê bin pê dike. Komîteya Ewropa, CPT û Dadgeha Mafên Mirovan, di tecrîda li Imralî de nirx, norm, krîterên xwe tune kirine.
Nivîskar û rojnamevan, bi taybetî yên Kurd, divê tixubê estetîkê derbas bikin û zimanê diyalektîkê zemt bikin. Hawar daketiye.

## Reqa roj bi roj tê ava kirin



Roj bi roj welatiyên Reqayê vedigerin bajarê xwe û tevgera avakirina bajar jî zêde buye. Jiyan bi avakirinê li bajar xweş û geş dibe. Şaredariya Gel jî ji bo ku welatî dikan û avahiyên xwe ava bikin alîkariyê dide.
Di 17’ê Cotmeha 2017’an de QSD’ê Reqa ji bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ’ê rizgar kir. Piştî ku Reqa hat rizgarkirin heta niha bi deh hezaran welaltî vegeriyane warê xwe. Niha jî welatî bajarên xwe ava dikin û tevger lê zindî buye.
Yek ji karkerên avahiyan Fadil Elî têkildarî mijarê wiha got: “Bajarê me di salên derbasbûyî de wêran bû. Îro ji bo avakirina bajêr em dixebitin. Bi keda xwe û keda mirovên bajêr em ê bikin ku ji berê çêtir be. Divê kesên ku derketine derveyî welat, vegerin û bajarê xwe ji nû ve ava bikin.”
Têkildarî mijarê serokê Daîreya Fenî ya bajarê Reqayê Mihemed Bekrî wiha axivî: “Em ruxsetên avakirinê didin. Heta niha zêdetirî 75 ruxsetên avakirina avahiyên bilind ku ji 6-7 qatan pêk tên, me dane. Her wiha 600 ruxsetên avakirina avahiyên ku bi awayekî beşî hatine wêrankirin, me keşf kirine.”
Bekrî wiha dewam kir: “Me xwediyên avahiyên ku bi temamî wêran bûne ji budçeyên avakirinê cuda kirine. Her wiha xwediyên avahiyên ku bi awayekî beşî wêran bûne û yan jî avahiyên nû ne, bi rêjeya ji sedî 30 me jê cuda kiriye.”… *ANHA*

## Navçe 120 sale avabuye, lê sîstema trafîkê tune ye



Li navçeya Xurmatû hê jî trafîka bi sîstema lempeyan nehatiye danîn, ji ber vê yekê pirsgirkên trafîkê derdikevin.
Ji serê sala 2018’an heya niha di nava Xurmatu de 65 qezayên trafîkê rûdane, di encama van qezayan de 6 kes jiyana xwe ji dest dane û 17 kes jî birîndar bûne.
Navçeya Xurmatû ya ser bi parêzgeha Selahedînê ya başûrê Kurdistanê di sala 1900’î de hatiye avakirin. Piştî wê di sala 1951’î de bû navçe. Lê heya niha sîstema trafîkê ya bi lempeyên ceyranê tê de tune ye. Ev jî dibe sedem ku di trafîkê de pirsgirêk derbikevin.
Yek ji şoforên teksiyan Umêd Xurşîd li ser vê yekê axivî û diyar ku di nava Xurmatu de gelek hatin û çûyînên otomobêlan heye û got: “Rê gelek qelebalixin, şofêr pêwîste di dema karkirina otomobîlê de gelek hestyar tevbigere. Divê di demek zû de sîstema trafîkê ya bi gulupên ceyranê were danîn.”
Fermandarek yê di rêveberiya polîsên trafîka Xurmatû yê bi navê Zenun Kerîm jî li ser heman mijarê axivî û got: “Ji ber nebuna sîstema trafîka bi gulupên ceyranê gelek pirsgirêk di trafîkê de çêdibin. Divê li ser rêyên giştî trafîk werin danîn.”
Bi giştî 5 rêyên sereke yên Xurmatû pêwîstiya wan bi trafîkê heye, ji ber ku di van rêyan de gelek hatin û çûyîna otomobîlan heye. Herwiha rêya bazirganiyê ya di navbera Iraq û Îranê de jî gelek çûyîn û hatin li ser heye. Ev jî pirsgirêkê ji bo trafîka Xurmatû re çêdike.
Welatî û şofêrên navçeyê bang li hikûmetê dikin ku di demek zû de sîstema trafîkê li navçeyê bê danîn…*ROJNEWS*



# Em ê rê li ber tundiyê bigirin

**Bi rasthatina 25’ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinan ya Cîhanê li Bakurê Sûriyê çalakiyên jinan dewam dikin. Seroka Buroya Jinan a Partiya Pêşerojê ya Sûriyê a Şaxê Şehbayê Xada Hemdo destnîşan kir ku ji bo ew bi temamî pêşî li şidetê bigirin ew xebat û têkoşîna xwe didomînin.**



Seroka Buroya Jinan a Partiya Pêşerojê ya Sûriyê a şaxê Şehbayê Xada Hemdo destnîşan kir ku wan di warê perwerdekirina jinan de û her wiha ji bo tundiya li ser jinan dawî bikin, gavên girîng avêtine.
Bi boneya Roja Têkoşîna li dijî Şîdeta li ser Jinan Seroka Buroya Jinan a Partiya Pêşerojê ya SûrIyê ya şaxê Şehbayê Xada Kor Hemdo destnîşan kir ku pergalên desthilatdariyê, di hemû qadên civakî de jin bê rol hişbitbûn û da zanîn ku bi vî rengî desthilatdariya xwe birêvedibirin.
Xada diyar kir ku ew niha di hemû qadan de li dijî tundiya li ser jinan têkişînê dikin. Xeda wiha got, “Em têkoşîna li hember tundiyê bi rêxistin kirin û avakirina saziyan dikin.”
Xada derbarê jinên li Şehbayê de jî wiha got: “Jinan li Şehbayê gelek êş û zehmetî kişandine. Lê ev ewrên tarî êdî radibin. Jin êdî dikarin di hemû qadan de bi rola xwe rabin.”
Xada da zanîn ku ew bi boneya 25’ê Mijdarê ji bo jinan semîneran lidardixin û ji bo ku jin bikdaribe bi rola xwe ya civakê de rabe ew nîqaş dikin.
Di dawiyê de seroka Buroya Jinan a Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Şaxê Şehbayê Xada Kor Hemdo wiha got: “Ji bo perwerdekirina jinan em rojane di buroyê de dixebitin. Bi rêya serlêdana partî û saziyan û bi rêya semîneran em hewl didin rê li ber tundiya li ser jinan bigirin.”... *ANHA*

## Kampanyaya ‘Tundiya li jinê polîtîk e’


Tevgera Jinên Kurd li Ewropayê (TJK-E) bi beşdariya bi dehan meclîs, komun, însiyatîf û saziyên jinan ên li Ewropayê dest bi kampanyayeke nû kir. Kampanya bi şiyara ‘Tundiya li jinê polîtîk e’ dest pê kir û wê salekê bidome. Kampanya ji sê qonaxan pêk tê. TJK-E’yê û saziyên jinan ên pêkhateyên kampanyayê li ser mijarê daxuyaniyeke nivîskî dan.

### KAMPANYAYÊ DUŞEMÊ DEST PÊ KIR

TJK-E ku şîdeta li jinê weke mijareke ‘nabe bê taloqkirin’ dibîne, ji roja duşemê û pê ve dest bi kampanya bi navê ‘Şîdeta li jinê polîtîk e’ kir. Yek ji dirûşmên kampanyayê ev e: ‘Ew kes dibe ku tu bûya’. Di daxuyaniyê de hate gotin, “Em dixwazin ji xwe dest pê bikin û civakê biguherînin. Li ser şopa rastiya xwe em dixwazin rêya rastiyê bibînin.”
Di daxuyaniyê de hate bibîrxistin, di bingeha felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de azadiya jinê heye û diyar kir, her jin û mêrên ji bo azadiya gelê Kurd têdikoşin, divê xwe ji nava şîdeta sîstema sîstema baviksalariyê rizgar bike.

### KAMPANYA WÊ SALEKÊ BIDOME

Li gorî daxuyaniyê, kampanya wê salekê dewam bike. Di nava salekê de wê li dijî zîhniyeta ku çavkaniya şîdeta li jinê ye û xwediyên vê zîhniyetê çalakî werin lidarxistin û helwest bê nîşandan. Jin wê bi vê armancê mafê xwe yê xweparastinê bi kar bînin. Ji bo analîzkirina aliyên siyasî, aborî, çandî û dîrokî yên şîdetê wê karê perwerdeyê bê kirin. Jinên ku şîdetê weke çarenûsa




xwe dibînin wê bi rêxistinbûnê werin xurtkirin û mafên wan bên bibîranîn.

### QONAXA DESTPÊKÊ YA KAMPANYAYÊ: PERWERDE

Di qonaxa destpêkê ya kampanyayê de wê li ser pêwendiya mêtingeriya jinê bi sîstemê re perwerde bê dayin.

### QONAXA DUYEMÎN: ÇALAKÎ Û RÊXISTINBÛN

Qonaxa duyemîn wê ji pratîkê, ji çalakî û rêxistiniyê pêk were. Bi vê armancê wê mîtîng, xwepêşandanên li qadan, meş bên organîzekirin, afîş bên daliqandin û belavok werin belavkirin.

### QONAXA SÊYEMÎN: ÇAREYÊN MAYINDE

Di qonaxa sêyemîn de jî ji bo pêşî li şîdeta li jinê were girtin, wê bi rêya sazîbûn û rêxistiniyê çareseriyên mayinde bên afirandin.

### ŞÎDETA LI JINÊ POLÎTÎK E

Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku her şêweyê şîdeta li jinê pêwendiya xwe bi êrîşên polîtîk ên sîstemê re heye û hate gotin, “Ji ber vê yekê şîdeta li jinê polîtîk e. Şîdeta li jinê çeka herî mayinde, bi bandor û daîmî ya sîstemê ye.”

## Bi tekoşînê tunduyê kêmbikin û jiyana hevbeş avabikin

Melek DEMÎRTAŞ

Bi boneya 25’ê Mijdarê Roja Tekoşîna li Dijî Tundiya li ser Jinan, jinên bajarê Qamişlo hest û nêrînên xwe ji rojnameya Ronahî re anîn ziman û Jinan diyar kirin ku wê jin li Rojava û Bakur û rojhilatê Sûriyê di hemû qadan de têkoşîna azadiyê bilindtir bikin û li dijî zihniyeta desthilatdar têkoşînê pêş bixin wê ne tenê rojekê, hemû rojan li dijî tundiyê tekoşîn bê navber were kirin.

### BÊ MAFÎ TUNDIYA HERÎ GIRA NE


Endama Navenda Aboriya jin Şîlan Semîr El-Anî diyar kir ku dema tundî tê gotin destpêkê lêdan tê bala mirovan lê çi kesê bê mafî lê werê ew tundî bi xweye û wiha got: “Ji bo wê jî dema ku mêr rêbazê tundiyê ser jin an zarok bi kar tîne, ew kes di xweze ziyîftiya xwe bi tundiyê veşêre. Dê jin bi vîn û îradeya xwe ya azad dikarin rê li şîdeta mêr bigrin. Û Şîlan bi bang bi dawî kir: “Di 25’ê Mijdarê roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Ser Jinê ya Cîhanê em bang li hemû jinên berxwedêr dikin û dibêjin hemû hêza xwe bikin yek û ji tundiyê re bibêjin êdî bes e.”


### BI TEKOŞÎN Û BERXWEDANÊ TUNDÎ TUNE DIBE

Endama Komîna Şano Silava Ibrahîm jî anî ziman ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo azadiya jinê xwedî têkoşîneke mezine ku jin ji tarîtiyê derxist ronahiyê û wiha got: “Tecrîda li ser Rêber Apo tecrîda li ser hemû jinane, her wiha jin di dîrokê de her tim di du eniyan de şerê hişmendî û çekî kiriye, mîna ka wê jî YPJ bi berxwedana xwe ya li hember çeteyên DAIŞ’ê û zihniyeta tarî şer kir û ji bo hemû jinan bû hêviya azadiyê. Û wiha bi dawî kir: “Em li jinên Rojava û Bakur û rojhilatê Sûriyê bi pêşengtiya YPJ’ê de têkoşîna ji bo azadiya jinan dewam bikin û hemû jinan azad bikin.”

### BI PERWERDÊ EMÊ TUNDIYÊ HILWEŞÎNIN


Mamoste Selma Xanim ji pêkhateyên Ereb diyar kir 25’ê Mijdarê Roja Piştevanî û Têkoşîna Navneteweyî ya li hemberî şîdeta li ser jinan e, da ku tundî kêm bikin emê asta têkoşînê bilindtir bikin û wiha got: “Bi hezarên salane ku jin rastî hemû cureyên tindiyê hatiye, Ji bo ku jin bikaribin bersiva êrîşan bidin divê berî her tiştî xwe perwerde bikin. Emê bi perwerdê xwe zana bikin û li dijî hemû êrîşan bisekin.”
Selma bi van gotina bi dawî kir: “Heta ku jin ne azad be mirov nikare bahsa civakeke azad biike. Ji ber ku bingeha civakên azad jinek azad e û tundiya ku li ser jinan tê meşandin bi armanca têkbirina wê civakê tê kirin. Têk birina tundiyê bi jina perwerdekirî û zana dikarin civak û jinê azad bikin.”







## Cîhanek bedew bi jina azad pêkan e



Avesta AMARGÎ

Pergala mêr yê serdest, di şexsê jinê de bi her awayî jiyan dorpêç kiriye. Mirovahî, di aliyê siyasî, polîtîk, çandî, civakî û nasnameyî de qeyranên cidî dijî. Rêber Apo, di parêznameyên xwe de bingeha tevahî qeyranên civakî bi ketina jinê re girê dide û li hemberî wê, ya pêwîste werê kirin çiye, daniye holê. Em di roja îro de li rewşa jinê ya di civakê û jiyanê de binirin kêmek bejî emê, xwe nêzî rastiya bi êş ya tê jiyîn bikin. Her ku di jinan de zanîn pêş dikeve ewqasî jî pergala serdest û mêrê desthilatdar kemera xwe ya li ser jin û civakan, şidandiye teng dike. Di vê manê de dîroka mirovahiyê bi ceribandinan ve tijiye. Her çiqas ceribandinên serdestiyê hatibin jiyîn jî, lê ewqasî jî li beramberî wê ceribandinên jinên berxwedêr û civaka polîtîk û Exlaqî di dîrokê de têra xwe hene. Yek ji wan rojana jî roja 25’ê Mijdarê ye. Roja 25’ê Mijdarê, di encama tekoşîna sê xwişkên şoreşger de weke roja tekoşîna şideta li dijî jinan hatiye pejirandin.
Belê, em ber bi roja 25’ê Mijdarê ve diçin. Ji bo ku mirov rastiya 25’ê Mijdarê rast fam bike pêwîste rewşa tekoşînê ya jinan di roja îro de baş bibîne û şiroveyeke rastteqîn bi pêş bixîne. Li Kurdistanê û tevahî cîhanê ji bo xwedî li derkedtina vê rojê, jin li ser piyane. Tekoşîna sê xwişkên Mirabal her çend di dema xwe de nehatibe fam kirin jî lê, îro çîroka van her sê xwişkan di serî de li Kurdistanê û li tevahiya cîhanê di dilê her jinekê neqişiye. Gelên berxwedêr çawa bi rihetî nasnemeya berxwedêriyê bi dest nexistine, jinan jî wisa bi rihetî van rojan bi dest nexistiye. Bêgoman bi bedel û êşên giran ev roj hatine bi dest xistin. Bûyera sê xwişkan, beriya niha bi 58 salan pêk hat. Hema bêje ber bi nîv sedsalî ve diçe. Lê ji ber ku di hişmendiya serdestiyê de bi qasî serê derziyê bejî guhertin tuneye, îro di şexsê çeteyên Daiş’ê de carekî din li hemberî tekoşîna jinan 25’ê mijdarê ji nûve hatiye zindîkirin. Roj bê kuştin, revandin û tecewuzkirina jinan derbas nabin. Bi derketina çeteyên Daiş’ê re Rûyê pergala serdest yê herî qirker û hovane derket holê. Hêzên serdest ji bo rûyê xwe yê qirker veşêrin çeteyên Daiş’ê weke kom bi nav dikin, ta ku sûcên li hemberî jinan dikin sivik werê dîtin. Lê di rastiyê de ew ne komin pergal bi xweye. Îro her roj li welatên cuda, bi destê mêran jin têne kuştin. Tişta herî bi êş ewe kuştina jinan êdî ji aliyê civakê ve normal tê dîtin. Di serî de pêwîstî bi rakirina rewşa ku kuştina jinan normal dibîne heye. Em di civakê de kijan bûyerê lêkolîn dikin, rastiya jinê derkeve. Ev rastî tê wateya ku em nikarin civakeke azad bê jina azad bifikirin. Ev heqîqeteke, bi civakbûyînê re yekpareye û nayê paşçavkirin. Her çiqas tekoşîna jinan îro di asteke bilind de tê meşandin lê, ji bo avakirina cîhaneke bedew û azad têrê nake. Rêber Apo di hevdîtinên xwe yên 2014’an de wiha gotibû; “Ez nêzîkatiya jinan ya ji bo azadiyê pir nepixandî dibînim ev jî rewşekî gelek xetere. Ez ji we dipirsim, heya niha we zilamek azad kiriye an ne.” Ev rastî têrê dike tevahî jin pêşeroja xwe bibînin ka rêbaz û şêwazek tekoşînê yê çiqas dijwar li pêşiya wan sekiniye.

